# Meryemnîgarê

*Berhevkar:*
**Evîndar Şevîn**

WEQFA
MEZOPOTAMYAYÊ

**Evîndar Şevîn,** di sala 1986an da li Çinarê hat dinyayê. Li Zanîngeha Eneqereyê beşa civaknasîyê xwend. Endamê lijneya kovara “Folklora Me” ye.

## Naverok

Pêşgotin / 7
Çend Gotin / 9

**Beşa Yekem 11**

Meryemnîgarê - 1 / 11
Meryemnîgarê - 2 / 41
Hesen û Hisên / 59
Mihemedê Gavan / 75
Bihemed û Ahmed / 83
Mîrbihemed / 91
Mîr Mihemed û Erebxan / 99
Mîr Mihemed û Gulîzarê / 111
Dudêrê / 121
Memlîcanê / 129
Tenafîla / 135

**Beşa Duyem 139**

Mêrû û Kêçê / 139
Sêbelê û Qumçelê / 143
‘Emo û Tisê - 1 / 147
‘Emo û Tisê - 2 / 153
Qîço, Mîço, Pîço / 159
Pîrê û Rêvî / 165
Çûk û Tûtûk / 169
Çîrok ‘Elik û Fatik / 171

## Pêşgotin

Folklor, gencîneya herî hêja ya miletan e. Bîr û raya miletî, rabûn û rûniştina wî, urf û adetên wî, sewt û awaz û raman û feraseta miletekî di nav behra folklorê da jîndar dibe, xwe nîşan dide. Hemû warên jîyanê xwe li folklorê digirin, folklor ji hunerê heta edebîyatê heta ilmên zanistî hemû waran xweyî dike.

Kurd, bi folklora xwe ya zengîn tên nasîn, ew zengînî gihîştîye wê dereceyê ku her kesê ku hatîye Kurdistanê pêşî çav li wê kirîye, Celadet Alî Bedirxanî nêzî sed sal berê bala xwe daye vê yekê û di Hawarê da gotîye, *di dinyayê da folklora tu miletî nagihîje dereceya folklora kurdan.* Folklora me wisa zengîn e ku hûn herin kîjan gundî hûn xwe bidin ber kîjan kal û pîrî dê gotin jê bibarin, dê çîrok û xebroşk heta sibehan li ber xwe bidin, folklora kurdan wekî kanîyeka boş diherike.

Kar û barên berhevkirina keresteyên folklorê, teorîyên di vî warî da, li dinyayê berbelav in, herçiqas folklor kanî be û zû bi zû nemiçiqe jî divê tim berhevkarî bê kirin û ew mîrate bê parastin, roj bi roj feyza wê kanîyê kêm dibe, rewşa zimanê kurdî ya malkambax jî rê li ber miçiqîna wê kanîyê vedike. Kurd êdî wekî berê şevbihêrkan çênakin, odeyên wan tune ne û gotinên xwe wekî berê neqil nakin. Loma divê em demildest xwe di vî warî da bigihînin û nesekinin, dest bi berhevkarîyê bikin. Bi vê boneyê me di sala 2017an da di bin banê Weqfa xwe da bi beşdarîya 20 berhevkaran û 6 mamosteyan perwerdehîya folklorê da destpêkirin. Piştî perwerdeyê Weqfa me cîhaz û materyalên teknîkî bo berhevkaran peyda kirin û hevalên me dest bi berhevkirin û deşîfrasyona keresteyan kirin. Divê perwerdehîyê da 10 berhemên folklorê gihan ber destê me. Ev berhem, yek ji wan berheman e ku li herêma Mêrdînê li Qosarê hatîye berhevkirin.

Weqfa me, piştî xebata perwerdeyê, bi derxistina kovara “Folklora Me” xebata xwe ya di vî warî da geş kir. Em hêvîdar in gelek kurd û gelek sazî xwe bidin ber vî karê pîroz û em bikarin bi lezgînî karê berhevkarîyê bikin, keresteyên folklora xwe berhev bikin. Wext li me dereng e, her roj her deqîqe, ev mîrate, ev zengînî noqî bin avê dibe. Bi avakirina sazîya folklora kurdan, bi rêya perwerde û berhevkirinê em dikarin vê mîrateyê nemir bikin.

Weqfa Mezopotamyayê